

DEMA BO KIRA LI XANÎ DIGERIN LI HEMBER XAPANDINAN HIŞYAR BIN!

Van salên dawîn li Finlandê xapînok û sextekar di warê kira girtina xanî de zêde bûn. Li hember wan hişyar bin.

Ajansen kire girtinê yên sextekar:

- Vî karî bi awayekî fermî û eşkere nake,
- Di ajansa emlakê de dixebite lê ne rayedarê kire kirinê ye.
- Bi pereyê pêşîn ji dest soza kire kirina xanî dide,
- Ji imze kirina kaxez û peymanan direve.
- Bê fiş û kaxez ji destê we pere verdigire
- Bi zêdehî pere dixwaze

Mirovê xapînok û sextekar,

- Dixwaze xaniyekî bide kire lê dibe ku ew xanî li tu deran nebe jî.
- Dixaze xanî bide kire lê heqê kire kirina vî xaniyê ne di destê wî/wê de ye.
- Kire dike bê kaxezên fermî
- Cih û xaniyê kêrê kire neyê kire dike.
- Dixwaze kaxezê imze bike an jî pereyê depositê ji we bistîne berê ku cihê kirê nîşan bide.
- Dixwaze tenê doşkekê an jî cihê razanê tenê kire bike.

EGER hûn ji destê sextekaran xanî kire bikin, hûn pere didin wan kesan ku heqê wan nîne ji vî karî pere bistînin. Ev tişt, bo aboriya we jî glek xerab e û dibe ku hûn pereyê xwe ji dest bidin. Bi vî awayî hûn beşdarê vî sûcê aborî jî dibin.

EGER, hûn ji destê sextekaran xanî kire bigrin, hûn nabin xwediye mafên fermî yên kiredar an jî mafên ewlehî. Dibe ku tiştê herî xerab jî bi serê we were û hûn bimînin bê cih û xanî li kolanan.

BIKIN:

A. Eger hûn bixwazin bê alîkariya kesekî li cihekî kire bigerin, tiştên ha li bîra xwe bînin:

- ✓ Pere dayîna ajansa kire kirinê kar û berpirsariya xwediye xanî ye, ne kar û berpirsariya we ye.
- ✓ Heqê kesî nîne ku jibo nîşandana xanî an jî rezerve kirina cihekî pere ji we bixaze.

B. Eger hûn bizwazin bi alîkariya ajansa kire kirinê bo xwe li cihekî kire bigerin;

1) Lazim di peymanê ku hûn imze bikin, ew xalên ha bi nivîskî hebin:

- ✓ Nav û imzeya him xwediye xanî, him jî berpirsare ajansê,
- ✓ Dema dirêjahiya qewl û peyman û xizmetan,
- ✓ Pereyê bê razandin, hesêba razandinê û wextê razandina kire û depositan lazim bi zelalî hatibe diyar kirin.

2) Lazim berê ku hûn cih an xaniyê kire kire girtinê nebînin û pê kêfxweş nebin, û hûn peymanê imze nekin, pere nedin kesî û dema we pere da jî, fişa xwe bistînin!

Jibîrnekin: Piştî imze kirina peymanê tu tişt nikare biguhere.

JIBÎRNEKIN

Ew pereyê ku hûn bidin ajansê ne pereyê depositê ye. Pereyê depositê piştî peyman hat imze kirin, lazim liser hesabekê bankê ku xwediye cih diyar dike, bê razandin.

Deposit bi pereyê ji dest nayê dayîn.

NEKIN!

Pere NEDIN ajansa kire kirinê

- × Bê fişa razandina pereyê
- × Bê peymanê yasayî
- × Pêşîn pereyê ji dest.

KIRE NEKIN xanî / cihê razanê tenê / doşkekê ji destê ajansên ne yasayî!

